

## Cejna Zimanê Kurdî Pîroz Be!.. - 14-15-16 Gulan 2020

14-15-16ê Gulanê, rojên Cejna Zimanê Kurdî ne.

Ev cejna, KNKê [Kongreya Neteweyî Ya Kurdistanê] bi pêşniyara Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKê li 2006ê îlan kir û ji 2007ê were jî tete pîroz kirin.

Bila pîroz be.

Her pîrozbahî, her peyamên di rojên cejna zimanê da tene dan, giring in, bihadar in. Lê belê, heke di jîyana rojane da Kurdî neyê axivtin, Kurdî di fermiyeta dem û dezgehên Kurdî da neyê bi kar înan, perwerde bi Kurdî nebe, her hewcehiyên jîyanê bi Kurdî nehatin kirin, zanist, huner, bi giştî edebîyat, nivîskarî, rojnamevanî bi Kurdî neyê kirin, ma merasimên formel, peyamên xav û rij bo çi ne, bi kêrî çi tene? Ma ne, gelî Kurda?

Eman, şaş tenegehînin, mexseda min "Gelî Kurdên bakur û dîasporayê" bû!..

Mixabin, belê rewşa zimanê li bakur û dîasporaya Tirkîyeyê îro ev e, kerem biken!..

### Di Cejna Zimanê Kurdî da:

#### Diyaloga digel Kurdek bakurî / Kurdek ji dîasporaya Tirkîyeyê

- Kurd î?
- Belê.
- Kurdî diaxivî?
- Carina.
- Kengî diaxivî?
- Vê gavê bûye mode ya... Rastî ez jî nizanim boçi, bes hema bo her demê rojê ez jî "Dem baş" dibêjim! Her hind. Kurt e ya!..
- Kengî naaxivî?
- Helbet gava axivtineke giring be, Tirkî dikem.
- Eve bû çi?
- Kurdayetîyê bi Tirkî dikim, ma nabe?
- Bo Cejna Zimanê Kurdî çi dibêjî?
- Ewil pîroz be bêjim!.. Lê zêde, çi bêjim, Kurdîya akademîk nizanim!.. Anku nikarim xwe bi Kurdî îfade bikem, lewma ez bi Tirkî bêjim: **Bu mevzu çok önemli, o nedenle Türkçe konuşayım... Dil Bayramı mı dediniz? Ha... Evet... Tabii... Kutlu olsun elbette... Ne diyelim, Kürtçe çok önemli, her Kürt ana dilini konuşmalı, bu çok önemli!.. Değil mi?.. Evet, Kürtçe konuşmak çok çok önemli. Böylelikle çok önemli konuşmamı Türkçe yaptım, kendimi ifade ettim... Ve Kürtler de anladı ne dediğimi... Bu, yani!..**
- Bravo! Te xwe baş îfade kir! Her bijî!.. Eve giring bû!..

### ROJAN HAZIM

14-15-16ê Gulanê 2020

Li Cejna Zimanê Kurdî

## Di Cejna Zimanê Kurdî da:

### Diyaloga digel Kurdek bakurî / Kurdek ji dîasporaya Tirkîyeyê

# xweza

- Kurd î?
- Belê.
- Kurdî diaxivî?
- Carina.
- Kengî diaxivî?
- Vê gavê bûye mode ya... Rastî ez jî nizanîm boçî, bes hema bo her demê rojê ez jî "Dem baş" dibêjim! Her hind. Kurt e ya!..
- Kengî naaxivî?
- Helbet gava axivtineke giring be, Tirkî dikem.
- Eve bû çî?
- Kurdayetîyê bi Tirkî dikim, ma nabe?
- Bo Cejna Zimanê Kurdî çî dibêjî?
- Ewil pîroz be bêjim!.. Lê zêde, çî bêjim, Kurdîya akademîk nizanîm!.. Anku nikarim xwe bi Kurdî îfade bikem, lewma ez bi Tirkî bêjim: Bu mevzu çok önemli, o nedenle Türkçe konuşayım... Dil Bayramı mı dediniz? Ha... Evet... Tabii... Kutlu olsun elbette... Ne diyelim, Kürtçe çok önemli, her Kürt ana dilini konuşmalı, bu çok önemli!.. Değil mi?.. Evet, Kürtçe konuşmak çok çok önemli. Böylelikle çok önemli konuşmamı Türkçe yaptım, kendimi ifade ettim... Ve Kürtler de anladı ne dediğimi... Bu, yani!..
- Bravo! Te xwe baş ifade kir! Her bijî!.. Eve giring bû!...

ROJAN HAZIM

14-15-16ê Gulanê 2020

Li Cejna Zimanê Kurdî

RH